Axiftinên di navbera heyivê û rojê da



Deyka Nazelînê

Roj gelek ya nexoş û ture bû ji heyivê anku şevî û gotê:

Te evro gelek mana xo dirêj kir û te bahira min jî bo xo bir. Ma tu naçî? Ma tu nahêlî dora min jî bihêt?

Şevê jî bi girrinjîn ve berê xo da rojê û gotê:

Her wekî te ya ji bîr kirî ku em yê li werzê zivistanê û demê min li vî werzî ji yê te dirêjitir dibît û yê te jî li werzê havînê gelek dirêj dibît.

Li vêre rojê çi nebû ku bersiva şevê bidet, hema serê xo çemand û çû, û şev .hat cihê rojê û husa dora xo kir